**Die Senatorin für Kinder und Bildung**

**Freie Hansestadt Bremen**

Die Senatorin für Kinder und Bildung · Rembertiring 8-12 · 28195 Bremen

Auskunft erteilt
Landesjugendamt

Ji bo
Tevahiya Dêûbavan ango Lênêrên Qanûnî

Bremen, 04.02.2022

**Guhertinên di Rêziknameya Koronayê de: Kreş û lênêrîna zarokan a danê rojê**

Stî û mîrzayên rêzdar,
dêûbav ango lênêrên qanûnî yên hêja,

bi vê nivîsê ez dixwazin di derbarê guhertinên di Rêziknameya Koronayê ya 30. de ku têkildarî saziyên lênêrîna zarokan a danê rojê ne, agahî bidim we. Ev yek di derbarê lênêrîna zarokên we ya li kreş û lênêrîna zarokan a danê rojê de ye. Armanca van guherînan ew e, ku pêşî li ber were girtin, da ku zarok ji bo demeke dirêj di karantînayê de nemînin. Piştî ku Rêziknameya Koronayê bo raya giştî hat belavkirin, hingê ev rêbaz dikevin meriyetê û ango gava hefteya kîtayê di 07.02.2022an de dest pê kir.

**Li gorî vê yekê ji bo zarokê/a we tenê ev rêbaz derbas dibin:**

1. Gava zarokê/a we bi koronayê ket, hingê divê ew bikeve îzolasyona navmalî.
2. Gava zarokê/a we li kreşê/ciyê lênêrîna zarokan a danê rojê (TaPs) bi kesekî re ketibe têkiliyê, ku testa wî ya koronayê pozîtîv e, hingê êdî pêwîst nake zarokê/a we bikeve karantînayê.
   Hingê zarokê/a we dikare bi berdewamî here kreşê.
3. Gava di koma zarokê/a we de testeke pozîtîv hebe, hingê kreş û TaPs dê agahî bidin we (testa xweser a di komê de yan jî li malê).
4. Hingê yekser ev derbas dibe: Divê zarokê/a we 5 roj li pey hev negatîv were testkirin.
5. Gava piraniya zarokên (20 %) di komê de pozîtîv hatibin testkirin, hingê bi qasî 5 rojan zarok ji xizmeta lênêrînê sûdê nagirin.
6. Gava encamên pozîtîv ên testê bi riya encamên negatîv ên testê yên ji aliyê navenda testê ve werin duristkirin, hingê ev tedbîr bi pêşdemkî betal dibe.

Eingang:
An der Weide 50

Dienstgebäude:
An der Weide 50

Bus / Straßenbahn:
Haltestelle
28195 Bremen

Sprechzeiten:
montags bis freitags
Hauptbahnhof
von 9:00 - 14:00 Uhr

- *Gava zarokê/a we korona girtibe xwejêrizgarkirina bi riya testê:*

Hûn dikarin piştî roja 7an bi riya testa li navendeke testê îzolasyona zarokê/a xwe biqedînin. Ev yek dikare testa zû yan jî PCR-test be. Divê her du test li navendên testê werin kirin. Testeke bi riya doktorê zarokan jî pêkan e. Bêyî testê îzolasyon herî zû di roja 10an de diqede.

- *Gava encama testa zarokekî din pozîtîv be:*

Kreş/TaPs dê agahî bide we, ku di kom/ciyê zarokê/a we de testa kesekî pozîtîv derketiye. Zarokê/a we ne mecbûr e rasterast bikeve karantînayê. Yanî ew dikare bi berdewamî here kreşê. Şertê vê yekê ew e, ku hûn di pênc rojên lênêrînê de (mînak duşem-în an jî sêşem-duşemê) bi xwe yan jî li navendeke testê testa zarokê/a xwe çêkin. Gava sazî vê xizmetê bide, piranî test li kreşê tê kirin. Gava hûn bixwazin dîsa jî li malê test bikin, hingê sazî di derbarê baweriya li ser piştrastkirina testê de biryar dide. Bo nimûne, sazî dikare ji we bixwaze, ku hûn testê nîşanê wan bidin. Gava encam negatîv be, hingê zarokê/a we dikare here kreşê.
Gava zarokê/a we li gorî Tedbîrên-Parastina-COVID-19ê-Rêziknameya-Awarte (§2 Hejmar 2,4) wekî kesekî derzî li xwe daye yan jî ji nexweşiyê baş bûye were qebûlkirin, hingê hûn ne mecbûr in her roj zarokê/a xwe test bikin.

- *Belavbûna li Kreş/TaPsê*

Gava di komekê/ciyekî de % 20ê zarokan pozîtîv hatibin testkirin (mînak 4 zarokên ji komeke 20 zarokî), hingê di wê komê de/li wî ciyî bi qasî 5 rojan zarok ji xizmeta lênêrînê sûdê nagirin. Ev yek ji bo wan zarokan derbas nabe, ku derzî li xwe dane yan jî ji nexweşiyê baş bûne yan jî di dema encama pozîtîv a testê de ne li kreşê bûn.

- *Zarokên derzî li xwe dane yan jî ji nexweşiyê baş bûne*

Em dixwazin, ku zarokên derzî li xwe dane yan jî ji nexweşiyê baş bûne wekî berê hêj jî testa xwe bikin, lê belê li gorî Rêziknameya Koronayê ew ne mecbûr in vê yekê bikin.

- *Di derdora şexsî de têkiliya zarokê/a we bi kesekî nexweşîgirtî re çêbûye:*

Gava di derdora şexsî de têkiliya zarokê/a we bi kesekî koronagirtî re çêbû, hingê ev rêbazên li jor diyarkirî ji bo we derbas nabin. Hingê zarokê/a we dikeve karantînayê. Divê hûn li gorî agahiyên daîreya xwe ya tendursitiyê tevbigerin.

- *Xizmeta acîl li kreşan*

Ez dixwazin bi vê yekê re agahî bidim we û ji bo vê yekê izrê xwe bixwazim, ku her çiqas rêbazên karantînayê ji bo zarokên we hatibin sistkirin jî, ev yek yekser nayê wê wateyê, ku zarokên we dikarin bi awayekî berfireh sûdê ji xizmeta lênêrînê bigirin.

Her çiqas xebatkarên li kreşan sê caran derzî li xwe dabin jî, ew jî dikarin bi koronayê bikevin. Loma dibe ku zarokê/a we ji bo hinek deman an jî ne li gorî çarçoweya tê xwestin sûdê ji xizmeta lênêrînê bigire, çimkî xebatkar nexweş dikevin.

Li gel silavên germ
Peywirdar

Thomas Jablonski
- Rêveberiya Daîreya Perwerdehiya Zarokên Biçûk -



*[Übersetzt in die Sprache Kurdisch]*